

Ewdilê Gerok

## Sefera Hindistanê - 11

Teyrê tawis li ser banê xanîyan, li bin sîya daran, mîna baweşîna keybanûyan perên xwe yên rengîn vekiribûn, nazenîn nazenîn digerîyan. Kurdên êzdî çiqas payeya pîrozwerîyê bidin vî teyrê, ewqas mafdar in.

Çimkî gelek delal û kubar e tawis. Hela rêveçûna wê ya nazenîn.. Ez neçûme Laleşê. Nizanim ji van teyran li wir hene? Tinebin, bila Êzdîyên me herin Mandawayê çend heb bistînin, bibin Laleşê.

Min li şûna teyrê tawis, wek dîyarîya vî bajarî mînyaturek wî ya rengîn a ji kirîstal kirî. Soz, rojekê rêya min bi Laleşê bikeve, ez ê vê tawisê dîyarîyê wir bikim.

Nîvro divê em ji Mandawayê herin Delhîyê. Çimkî balafira me sibe wê bifire Munîhê.



*Koşkên hunerî, neqîsandî û estetîk, Lêbelê terîkandî û wêran, li Mandawayê. Ewqas sal in rengên wênayan hîn jî birîqî, kişîner û zindî ne. Berê eşraf û bazirganên bajêr lê rûdiniştin, niha ba û qûm tê da li ba dîbin.*

*Li şûna jinên delal, pîrhevoq û dûpişk, tê da di govendê da ne...*

**Veger:** Saet 14 ê nîvro yê em ji Mandawayê derketin. Germayîya çolê û ya Hindistanê bi hev ra dikelijîn. Mîna tendûr Mandawayê dişewitandin. Min kirasê xwe şil kiribû li serê xwe pêça bû. Di nava çend deqeyan da kiras zuwa dibû, dîsa jî herareta min danediket. Şansê me hebû, ku kilîmaya otobosê baş dixebitî. Hewa nedilivî. Min carinan devê xwe dida ber klîmayê ji wir nefesê digirt. Almanan jî li min nihêrîn û wisa kirin. Ji bilî Hansî. Tewr ne xema wî bû, te digot qey li çolê ji dê bûye.

Nîvê rê xirabe bû, ji nû va dihate çêkirin. 2 saet em di vê rêya xirabe da çûn. Li cîyekî rê, yek ji tabelayên trafîkê ya jorê, ji bayê şikestibû. Hin karker ew rast dikirin. Karker hêdî dixebitîn. Ne germ û ne jî rêwîyên di nava wesayîtan da ku

mîna di hemamê da xwê didan, xema wan bû. Hewar û gidîya me feyde nedikirin. Ev temîr saetekê ajot.

Wesayît 4-5 km li pey hev sekinîbûn. Karkeran paşê maşîne û aletên xwe ji ser rê kişandin, rê dan û em derbas bûn.

Her yek ji me nîvxerîqî bû. Hew me dît otobos xwe gîhandîye ser otobana Delhîyê. Em şa bûn, me got îcar em ê zû herin. Ji Delhîyê ra 100 km. mabû.


Delhîya ku biqasê welatekî mezin e û deryaya meriv û wesayîtan e. Heta perên bajêr em zû hatin. Qîyamet jî ji wir şûn da dest pêkir. Ji perê bajêr heta otela nêzîkê balafirxaneyê, ku em ê ew şêv lê bimînin 45 km. ye.

Dema em hatin ser otobana Delhîyê trafik giştî xitimî bû. Wesayît li pey hev sê-çar kîlomêtro dirêj dibûn. Gelek otoban, ji der û dora Delhîyê diçin nava bajêr. Li ser hemûyan jî trafik karesat bû. Nemaze di saetên sibe û êvarê da. Wesayît santim bi santim pêşva diçûn. Divê esabê meriv zexim û sebra meriv pir fireh be, di wan rêyan da. Yan na meriv dê serî biçeliqîne, yan jî rast li qeyrana dil bê. Li Hindîyên di wesayîtan derdorê xwe da dinihêrim, ne xema wan bû. Diranên wan, spî dibiriqî ji kenê. Êdî ji sebrê ye, ji dînbûnê ye, nizanîm.

Di ser da belkî di wesayîtan wan da kilîma jî nîne. Hela ji xwe qerebalixa trafîka nav bajêr, meriv nikare vebêje. Tuktuk, otomobîl, otobos, qamyon heta tu bêjî tije mirov in. Erebyên ku barê kamyonekê lê kirine jî di ser da. Peyayên ku li ser û pişt wan bi kîloyan bar, mîna gerîneka avê li hev ba dibûn, di wan rêyan da. Balkêş e, li gorî wê qerebalixê, qeza kê m çêdibin! Hindî êdî bûne profesyonelê wan rêyan. Herhal ji ber vê ye, ku hukumat guh nade pirsgerêka trafîkê.



*zavayê derengmayî*



*pêlikên dawî li Mandawayê*

Otobosa me rêya 45 kîlomêtroyî encax karî di çar saetan da temam bike. Her yek ji me nîvxerîqî, me xwe bi zorê gîhande otêlê. Dema em hatin otêlê saet nehê êvarê bû. Balafira ku em ê pê bifirin Munîhê wê di 03 yê beyanîyê da rabe. Hîn şeş saet dema me hebû. Serşûştin, şîv, amdekirina bawolan felan, ji xewê ra

dem nedima. Yanê em dê ev şev ranezana. Me li şivê, westîna rê, hinek bi dûr xist. Ew şiva me ya dawî ya bi hev ra bû.


Piştê xwarin, vexwarin û sohbetê, rêberê me Paragamî dema ji me xatir xwest, soz da min, heke ew were Berlînê, ew dê bibe mêvanê min.

Baş bû, ku otêl nêzîkê balafirxaneyê bû, yan na, di wê kaosa trafikê da em dê negihîştana balafirê. Di saetên şevê da trafik hinekî diherikî.

Saet yekê şevê em li mînbosên ku acenteya turîzmê kiri kiribûn, siwar bûn û di nîv saetan da hatin balafirxaneyê.

Li vegeerê nexweşiyên min, hinekî xwe ji min dûr kiribûn. Bi çavên beyaniyê û ji ber "pirbûna" demê, vêca min derfetê dît, balafirxaneya Delhîyê çêtir bibînim. Ji ber ku deriyên navneteweyî ne, temaşeya li balafirxaneyan jek ji hobbîyên min e. Navê seroka berê ya Hindistanê Îndira Gandîyê li balafirxaneyê kirine. Ev balafirxane bi sê termînalên xwe yê nûjen û mezin, yek ji mezintirîn balafirxaneyên cîhanê ye. Ev balafirxane, piştê ya Bombayê li Hindistanê duyemîn e. Termînalên 1. û 3. yê navneteweyî ne. Di nava her termînalê da jî bi sedan şartel û gata hene.

Ji gataya A.yê heta ya H..K. yan jî L.yê 3-4 km. ye. Heke dem kin be, meriv encax bi revê dikare xwe bigihîne balafirê. Mîna balafirxaneya Frankfurtê, ji bo kesên kal, pîr û nexweşan, erebeyên biçûk di navbera gatayan da diçin û tên. Ji aliyê dekor û mîmarîya hundurîn va jî taybetiyên Hindistanê dane balafirxaneyê. Wêneyên li dîwaran, peykerên fil û ajalên, figurên kesên ku yogayê dikin, maketên cîyên dîrokî yê Hindistanê, atmosfereke hunerî dide wan her sê termînalên. Kapasîteya wê ya rêwîyan salane 60 mîlyon ye. Ji ber firehbûna nava balafirxaneyê bîhna meriv jî lê fireh dibe, di gel ewqas qerebalixê. Ew roj ez jî yek ji wan mîlyonan bûm.



*Bêhnvedana encamê li ber dîwarê sor*



*Saeta dawîyê li balafirxaneya Indra Gandî ya Delhîyê*

Her sefer vegerekê xwe heye. Her veger xemgînî û şayîyên xwe. Hefte û rojên seferê debas bûn. Niha saetên dawî yê sefera min a Hindistanê ye.

Dawîya meşê hatim ber gataya ku balafira min jê radibe. Helbet ne "balafira min," ya Lufthansayê ku ez ê pê bifirim Mûnîhê. Hîn saetek maye ji firînê ra.

Ji niha da 400-500 kes li salona gatayê, li benda firînê ne. Teyrehûta ku dê me hemûyan gaveke şûnda daqurtîne li derva li benda me ye.

Min hinekî din jî li dîwarên balafirxaneyê yê mîna galerîya wêneyan temaşe kir. Tawilê derîyê gatayê vebû û em ketin zikê balafira A380 ya duqat. Zûtirîn dem çûm li cîyê xwe rûniştim. Ez li hevalên di gurubê da gerîyam, her yek li derekî balafirê rûniştibû.

Ji bavalên vala û tije bêhtir, di her seferê da meriv ji barên bavolan zeftir bîranîn dibe û tîne. Şopên hin ji wan kûr in. Bi salan ji bîr û hişên meriv dernayên. Hinine mîna pelê ne, meriv bi giraniya wan jî nahese. Bi armanca vê nivîsê min xwest giraniya sefera Hindistanê hinekî sivik bikim.

Bû gurrîn û gujîna teyrehûta me ji erdê rabû. Qirasepozê xwe ber bi ewran da bilind kir. Kêlîyek şûnda em li ser ewran bûn. Ew balafira ezamet, te digot qey dişimite li ser deryaya qeşayê. Roj li ser Asyayê hildibû. Rengekî wisa awiqîner dabû asûmanê. Ne heddê bavê ti wênesazê bû, ku wê wêneyê çêkira. Heke careke din herim Hindistanê misoger ez dê herim Bombayê. Ew bi Booliywoda xwe, bi reng û awazên xwe, bi serê xwe cîhanekê ye. Helbet ez ê herimê lê piştê sefera Çînê.. Bi van xem û xeyalan di xew ra çûm. Dema min çavên xwe vekirin 6 saet derbas bûbûn, em hatibûn ser asûmanê Mûnîhê.



*Du saet berê dawîya seferê li stasyona Frankfurtê, ber bi Berlînê va. Hingî ji welêt derketime hîn rêwî me. Gerçî li wir jî rêwî bûm, le ne rêwîyê welatan. Bi rastî mirov her rêwî ye: Ji tinebûnê ber bi tinebûnê da. Qonaxa wê/wî ya di jîyanê da çavvekirinekê ye li jîyanê. Mîna tevgera li qosmosê. Tinebûn, hebûn û dîsa tinebûn. yan jî bi gotinekê dîn: Windabûn-peydabûn-windabûn....*

Kêlîyek şûnda A380 bi wê fort û forsa xwe li balafirxaneyê danî. Yanê lê jî dihat, ew fors û fort. Heta min berê xwe da xetên navîn, saetekê derbas bû. Çi demê li balafirên nav Almanayê siwar bim, mîna li otobos û trênen nav bajêr siwar bim, ewqas bi min hêsan e. Ne heyecan heye, ne panîk.

Min li balafirxaneya Mûnîhê bi qasê vexwarina qehweyekê kêysê dît û li balafirê siwar bûm. Saetek şûnda hatim Frankfurtê û bi lez çûm stasyona bajêr.

Dem a ji stasyona trêne ya Spandaûyê derketim, li Berlînê bayê berîya nîvroyê rûyê min alast û bi valsa xwe ez pêşwazî kirim. Ez û ba. Libabûn û aramî.

Ka ev ba, îcar berê min bide kîjan seferê?

Berlîn, 04 avrêl 2018  
Ewdilê Gerok

dawî